Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S 1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (261) | Çileya Paşîn / 15-01-2024

# Human Rights Watch radighîne girtin û revandin li deverên di jêr destê PYD de berdewam e




Kurdistan-Bidûvçûn

Rêxistina Human Rights Watch di raporta xwe ya cîhanî 2024'an de ragihand, sivîl li Sûriyê di sala 2023'an de rastî binpêkirinên zêde hatine ji aliyê Hikûmeta Esed û aliyên din yên şerker, û ev welat rastî kirîzeke tund ya abûrî hatiye.

Li gor rêxistina Human Rights Watch, li deverên di jêr destê rejîma Esed e, hêzên ewlekariyê welatiyên wan deveran di nav de penaberên vegryabûn rastî girtin, îşkence û windabûn û astengiyan kirine.

Herwiha bi milyonan xelk xwarineke baş ji bo wan nehatiye dabînkirin, ji ber rejîma Esed arasteya alîkariyên xwarinê guhertiye û pirsgirêkên abûrî jî çareser nekirine ku vê kirîzê hiştiye gelek kirîzên din derkevin, jibilî vê yekê derencamên sizayên navdewletî diyar dibin li ser xelkê Sûriyê.

Rejîma Esed jî binpêkirinên xwe ranewestandine, û welatên Erebî jî ew vegerandin nava Komkara Erebî.

Li beşekî din yê raporta rêxistina Human Rights Watch behsa deverên di jêr desthilata Hêzên ser bi Partiya Yekîtiya Demoqratîk PYDê de dike, di raportê de hatiye li deverên Bakurê rojhilata Sûriyê ku Rojavayê Kurdistanê jî di nav de girtin derheqê welatiyên sivîl de berdewam e di nav wan de rojnamevan jî hene li gor raporta Neteweyên Yekgirtî ya Îlona sala 2023'an ku mirina çend kesan li zindanên navendî yên Hesekê û Reqayê belgeh kiriye.

## Revandina zarokeke 14 salî, ev du meh in çarenivîsa wê nediyar e

Kurdistan

Zarokeke Kurd ku nêzîkî du mehan e li taxa Şêx Meqsûd a Helebê ji aliyê Tevgera Ciwanên Şoreşger ya ser bi PYD ve hatiye revandin, heta niha çarenivîsa wê ne diyar e. Malbateke Kurd a Helebê ji Rojnameya Kurdistan re ragihand, keça wan Stêr Ehmed ya 14 salî ji 16 Mijdara 2023an ve li taxa Şêx Meqsûd ji aliyê Tevgera Ciwanên Şoreşger ve hatiye revandin û heta niha. Diyar kir jî, keça wan Stêr jidayikbûya sala 2009an e û ji pêş deriyê dibistana xwe hatiye revandin.

Malbata Stêrê bi Rojnameya Kurdistan bang li hemû rêxistinên mafên zarokan, rêxistinên yasayî û navdewletî û aliyên pêwendîdar dikin ku fişarê li Rêveberiya PYD û hêzên wê yên çekdar bikin ta ku çarenivîsa keça wan diyar bikin.

Taxên Eşrefiyê û Şêx Meqsûd ên Helebê, wek taxa Kurdan tê nasîn û di destê YPG de ye. Tevgera Ciwanên Şoreşger, rêxistinek ser bi PYD ve ye û berê gelek zarok û ciwanên Kurd li herêmên cuda yên Kurdî revandine û biçek kirine.



9 sal li ser şehîdbûna 4 Pêşmergeyên Roj derbas dibin *Rûpel—2*

Rojhilata Navîn û cîhan piştî bûyerên Xeza tevlihev dibe *Rûpel—3*

Rojdiyar Hemê.. helbestvanê strana Kurdî ya nûjen *Rûpel—4*

# 9 sal li ser şehîdbûna 4 Pêşmergeyên Roj derbas dibin

Kurdistan

Di 7’ê Çileya sala 2015’an de, 4 Pêşmergeyên Leşkerê Roj li Herêma Kurdistanê, di şerê mezintirîn rêxistina terorî li cîhanê rêxistina DAIŞa teror xwe kirin cangoriya xaka welatê pîroz, û navê xwe di nav refên pakrewanan de tomar kir. Pakrewan Besam Xelef, Basil Hacî Hacî, Xemgîn Qedrî, û Emgiyan Badînî, roja Çarşemê di 7’ê mehê ji sala 2015’an, li dibistana Xerayic li navçeya Tilefir li Herêma Kurdistanê bûne qurbanî û şehîd bûn.
Rêxistina DAIŞa teror di rêya otombîleke leşkerî ji curî Hamir, xaleke kombûneke hêzên Pêşmergryên Roj li gundê Birhêwe li navçeya Tilefer kir armanc, di encam de her çar Pêşmergeyên Leşkerê Roj şehîd bûn.

**Nav û bajarên wan Pêşmergeyan:**
Pakrewan Besam Mihemed Xelef ji gundê Girziyaretê Çolê, yê ser bi Girkê Legê yê Dêrika Rojavayê Kurdistanê ye.
Basil Hacî Hacî ji gundê Til Xinzîr yê ser Dêrika Rojavayê Kurdistanê ye .
Xemgîn Qedrî Osman ji gundê Dîrona Qulinga yê ser Dêrika Rojavayê Kurdistanê ye.
Emgiyan Mustefa Badînî ji taxa Muftî ya bajarê Hesekê yê Rojavayê Kurdistanê ye.
Di 8ê Çileya sala 2015’an, ango piştî şehîdbûna wan bi rojekê ji bo Rojavayê Kurdistanê hatin rêkirin, û li dergehê Sêmalka yê hevsînor navbera Rojava û Herêma Kurdistanê de, bi hezaran ji şêniyên Rojavayê Kurdistanê pêşewazî li cinazeya şehîdan kir.




Her weha şêniyek mezin xatira xwe ji wan Pêşmergeyan li Herêma Kurdistanê li pêş nexweşxaneya Pizîşka Dadwerî li parêzgeha Duhokê xwestin, û bi cenazeyan re ta sînorê Rojavyê Kurdistanê çûn. Her çar Pêşmergeyên Leşkerê Roj li nav xaka xwe, li Rojavayê Kurdistanê bi xak hatin spartin.

# Berdewamiya şer.. êş û azarên milet zêde dike

Hêvî Delî-Qamişlo

Berdewamiya êrîşên Tirkiyê li ser herêmên Kurdî li Kurdistana Sûriyê dibe cihê ne aramiyê, û metirsiyê li cem hemwelatiyan çêdike, di demekê de ku qeyranên mirovahî û şer li Sûriyê bi taybetî li herêmên Kurdî berdewam in, û dihêle asta êş û azarên xelkê pir dijwar û metirsîdar bibe, ku ji destpêka rûdana şerê Sûriyê ta niha welatî di rewşeke awarte ya mirovahî ya dirêj de asê mane û nifşek tevahî ji ciwanan ji paşeroja xwe bêpar mane, ji ber rewşa civakî û aborî ku îro rêjeya ji sedî 90 dibin hêla hejariyê de dimînin.
Hemwelatiyên Kurdistana Sûriyê pir zext û zehmetiyên dibînin di dabînkirina xizmetguzariyên sereke yên jiyanê û tunebûna ewlehî û aramiyê, nexasim piştî êrîşên Tirkiyê yên vê dawiyê di 2023’an de, li ser navçeyên Kurdî yên Kurdistana Sûriyê ku binesazî û navendên xizmetguzariyê yên sereke kirin armanc mîna cihên avê û elektirîkê, û petrolê, ku yek ji navendên bingehîn yên jiyankirina mirovan e. Ji aliyekî din ve ji bilî rewşên ku milet li Kurdistana Sûriyê têde derbas dibin ji têkçûna rewşa abûrî, û civakî, tendirûstî, derbider û koçberî, hejarî, bi serda jî şer û ceng êdî êşa gel zêde dike, derbarê êrîşên Tirkiyê yên vê dawiyê ser bajarên Kurdî Ku di 25’ê Berçileya 2023’an, Balafirên şer yên Tirkiyê bi dironan êrîşên xwe li ser sazî û pêgehên xizmetguzariyê yên bingehîn li bajar û bajarokên Kurdistana Sûriyê pêk anîn, her yek ji bajarê Qamişlo, Amûdê, Dirbêsiyê, Kobanê, Dêrikê, û cihên sereke û pêwîst yên jiyanê kirin armanc û bombebarankirin, weku nexweşxane, westgehên petrolê, stasiyonên Kehrebê û avê, ku bo sedema ji kar werin rawestandin û gelek ziyanên madî û canî li peyî xwe hiştin, û ev yek bêguman bû cihê tirsê û ne aramiyê û bandoreke herî dijwar li ser rewşa xelkê kir, ku Turkiyê her demekê êrîşên xwe ser Herêmên Kurdî tundtir dike û jêrxaneyên sereke dike armanc, ku hejmara êrîşên vê dawiyê yên azmanî yên firokeyên Turkiyê gihişta 46 êrîşan, û Para mezin li bajarê Qamişlo bû û cihên hatin encamdan di nav de westgehên kehrebê, û avê ,Sayloyên genim, nexweşxane, armanc ji vê yekê ku milet koçber bibin û navçeyên Kurdî werin valakirin. Di hevdemê kiryar û binpêkirinên Tirkiyê û girûpên çekdar yên bi ser wê ve li der heqê xelkên Serê Kaniyê, Girê Spî de berdewam e bi taybetî li Efrîna Rojavayê Kurdistanê ji kuştin, revandin, û destdanîna ser zeviyên hemwelatiyan û rojana bi sedan darên zeytûnan yên şêniyên Ffrînê têne birîn û talan û wêrankirina mal û milkên wan û li şûna wan malbatên çekdaran hatine bicîhkirin ew jî bi armanca guhertina demografîk li Kurdistana Sûriyê. Herwiha di çarçoveya berdewamiya bêserûberiya çareseriya siyasî li Sûriyê tê wateya berdewamiya azarên gelê Sûriyê di vê qonaxa ku têde derbasdibin ku hîn jî şer û kuştin li Sûriyê heye, her li gorî raporta Rewangeha Sûrî ya mafê mirovan 1 çileya 2024’an de ragihan ku di sala bûrî de 2023’an, 1032 welatiyê sivîl di nav wan de bi sedan jin û zarok hene li ser destê aliyên şer ve li seranserî Sûriyê hatine kuştin belge kir, û herwiha astengî û kêşeyên li pêşiya wan derdikevin taybet di asta aborî de ku her diçe aloztir dibe û derfetên jiyanê tengtir dike, ku gelê Sûriyê bi giştî bi nebûna ewlekariya xwarinê re rûbirû ne û rastî zirarên mezin tên çimkî dahata malbatê têra pêdeviyên wê yên serekî nake, û daxwaza wan bi alîkariyan heye.



> «Pêwîste şer were rawestandin»

Hêjaya were gotin ku hersal bi sal hêviyên miletê Sûriyê ber bi aştî, azadî, ewlehî û dadmendiyê, û pêkanîna mafên we yên rewa ve zêde dibe, û çavên wan li çareseriyeke siyasîya, ku êdî bibe Sûriyayeke aştiyane û rewşa jiyanê baştir bibe.

# Rojhilata Navîn û cîhan piştî bûyerên Xeza tevlihev dibe



Emer Ismaîl

Tevî hêviya piştî êrîşa ji aliyê tevgera Hemasê ve hatî lidarxistin, Israîl ji aliyê leşkerî û ewlehiyê ve matmayî hişt û cîhan matmayî hişt, oparasyona Hemasê û rêxistinên cîhadî yên din li Xezayê yên ku di wê operasyonê de beşdar bûn. Rêbaza daxistina wê bargehê bi kuştin û revandina bêserûber, û belgekirina vê yekê bi vîdyoyan ji bo rakirina rêjeyeke mezin. Ji mêjiyên westayî yên cîhana Erebî û Islamî, rewanê tolhildan û serketinê di nav wan de bi cih dike. Vê kiryarê hişt ku Israîl êrîşên dijwar li ser Xezayê zêde bike, û ev îdeolojî encama berdewamiya nakokiyên li Rojhilata Navîn û destêwerdana hêzên mezin di şer de ye. Hêzên mezin pişta xwe bi faktora demê digrin, ji bo têkbirina hevbendiyên di navbera hêzên ku ji bo birêvebirina qeyranan kar dikin, vê destêwerdanê rê li ber kûrbûna rejîma Îranê vekiriye. Di kûrahiya qeyranan de, nakokiyan ji aliyê îdyolojî, mezhebî bihevre bikin û rêkxistinên terorîstî yên ku serdestiya desthilatdaran dikin, derdixin. Çend welatên wek (Îraq, Sûriye, Libnan, Yemen) çarenivîsa gelên herêmê û biryara şer û aştiyê desteser bikin. Zêdebûna tundûtûjiyê li Xezeyê, ku girêdayî Rojhilata Navîn ya aloze bandorek xurt li ser aştî û ewlehiya cîhanî kiriye, û nakokiyek mezin di helwestên hêzên herêmî û cîhanî yên bi bandor yên herêmê de derbarê tundûtûjiyê de derketin holê.

> **«Şerê Xeza berev qonaxên xerabtir ve diçe»**

Çareseriyên aştiyane nehiştin ji bo dawîkirina nakokiya di navbera Israîl û Filistîniyan de. Hemû nîşanan piştrast dikin ku şerê li Xezeyê nikare tundiyê bidawî bike, ji ber ku tundûtûjiya zêde ya ku ji hêla hemî aliyan ve tê kirin dê hawîrdorek bi kîn û tolhildanê ava bike û hevalbendan vegerîne.

Di navbera hêzên herêmê yên teng de ji bo vekirina eniyên nû û birêvebirina qeyrana şer û cengê Li herêma Rojhilata Navîn du cure yên alozî derbas dibe: 1- Pirsgirêkên gelên ku ji mafê çarenûs bêpar mane . 2- Li gelek welatan berdewamiya qeyranên navxweyî. Rojhilata Navîn piştî bûyerên( Xeza) di nêrîna min de ber bi qonaxên gelek hestiyar û xirab de diçe û ji gelê hermê, naxasim gelê Kurd bi yek biryar xwe dûr bikin ji vê qeyranê û li ser xaka xwe biminin çavnêrê paşeroj û encamên vî şerê giran bin, ji ber çareserkirina pirsgirêka gelê Filistînê di encama şer û tundûtûjiyê de, wê tundiyê li herêmên din jî gur bike, ji ber ku tevgerên rizgarîxwaz ên ku li pey aştî û demokrasiyê di tekoşîna xwe de ne, wê di nêzîkatiya xwe ya aştiyane de xwe bê maf û bêbandor bikin, û hêzên mezin û rêxistinên navneteweyî ji bo çareserkirina pirsgirêkên xwerêveberiya gelan divê destwerdanê bikin. Welatên ku tûşî qeyranên demdirêj dibin, rûbirûbûna van qeyranan bi rêya lihevkirin û danûstandinên di navbera hêzên destêwerdanê dikin û sînorên wan ên siyasî ji bo wergirtina krîzên welatên herêmê vekirî ne, û çareseriya herî baş ji bo van kirîzan pêkanîna biryarên navdewletî ye, ji bo dawîanîna van qeyranan û dabînkirina hemû pêwistîyên ewlehî û aramiyê.

# Rojnamevan Keremê Seyad.. Jiyan û Xebat

Lava Delî-Hewlêr

Medyakar û rewşenbîrê Kurd" Keremê Seyad" kesayetekî xwedî rol û bi bandor bû û xwedan karîzmayeke taybet bû di warê Rojnamevaniyê de, kar û xebata xwe bi dilsozî û rêzdarî di xizmeta gelê xwe yê Kurd dikir, herwiha jiyana xwe ji bo parastin û pêşketina wêja û Zimanê Kurdî terxan kir, Rojnamevanê Kurd" Keremê Seyad" di Radyoya Êrîvan de weku bêjer û derhêner kar dikir, û têde roleke berçev di belavkirina hişmendî û resteqînî, çand û zimanê Kurdî li Ermenistanê û welatên din yên Yekîtiya Soviyêta berê de pêşkêşdikir. Hêjaya ronahiyek li ser kurtejiyana rojnamevan Keremê Seyad: Rojnamevan “ Keremê Seyad Xalid “ ji dayîkbûna sala 1938an de, li gundê Heko yê bi ser navçeya Telîn li welatê Ermenîstanê,



> **Keremê Seyad xwedan karîzmayeke taybet bû**

Xwendina xwe ya sertayî û amadeyî û navendî li dibistana gundê xwe Heko bi dawî kir. Sala 1960 an de, weku Bêjerê zimanê Kurdî di radyoya Êrîvan de kar kir, li gel hevjîna xwe nêzîkî pêncî salî di vê radyoyê de xebitîn, di demekê de ku Hikûmeta Ermenistanê ji ber sedemên aborî dev ji piştgiriya beşê Kurdî ya Radyoyê berda, lewra hin xebatkarên radyoyê neçar man ku karê xwe rawestînin , lê “Seyad “ û hevjîna xwe bi xurtbûn û geşbûna hestên xwe yên niştîmanperwerî û kurdewarî û bi hestên hezkirinê karîbûn beşê Kurdî di Radyoyê de zindî bihêlin û weşana xwe berdewam bikin û her tim “ Seyad” tanî ziman û di got: ku ez xwe weke qehreman û lehengekî Pêşmerge dibînim, û hest bi erka xwe ya li hember welat, ziman û çanda xwe dikim.

Û hêjaya were gotin ku “Keremê Seyad “yek ji bêjerên bilind ên Yekîtiya Sovîyêtê bû, û di derbarê geşbûna karê wî di ragihandinê de gelek xelatên rêzgirtinê wergirtina, ku ji aliyê Hikûmeta Herêma Kurdistanê ve jî hatiye xelatkirin. Û di sala 2006an de, ji aliyê Hikûmeta Ermenistanê ve hate xelatkirin. Di 27ê Adara 2021an de, Rojnamevanê Kurd “Keremê Seyad” di temenê 82 an de koça dawî kir û li bajarê xwe Yêrîvanê bi xakê hat spartin.

# Rojdiyar Hemê.. helbestvanê strana Kurdî ya nûjen

Vanês Mîranî-Domîz

Bê guman her dema behsa helbestên stiranan di civata Kurdî de tête kirin, bi dest xwe re helbestvan Rojdiyar Hemê tête bala mirov, ew mirov e ye yê ku xudanê zar û peyvên bedew, ciwan, nazik û şêrîn.

Her wesa pirtûka ( ji geza sêvê min zanî ) ya helbestvan Rojdiyar baş zengîn e û pir û mişt e, ji babetên renge reng mîna siruşt û buhara Kurdistanê, û ew babet jî zor giring in, lewra piraniya wan helbestên wî jî mîna navê wî weke rojê tê de diyar û xuya ne. Belê, hîç guman tê de nîne ku gelek helbestên wî ji çendên stiranbêjan ên Kurdan kirine stiran û stirandine, çi ji Rojavayê welêt, yan ji Başûrê welêt, yan jî çi ji hindur û derveyê welêt.

Ji bo vê yekê jî ez bang li xwendevanên helbesta kurdî dikim ku pirtûka helbestvanê navborî ya ( ji geza sêvê min zanî ) bi hûrbînî û pir baş bixwînin.



Her weha işq û evîna welat, al, pêşmerge, rêbaz, ziman û dîrok, jî di helbestên wî de gelek diyar in.

Herwisa bang û hawara xwe digihîne Kurdan bi riya van helbestan, ku herdemî sê tiştan ji xwe re baş bikin xem mîna ( Ziman, Al û Kurdistan ), di heman demê de, di warê evîniyê de jî xweş ditajonê û yara xwe bi şêrîn şekir, kevok nav dike, û bi gula nêrgiz, nisrîn û sosin kar tîne, belê, xwe ji maçên dev û çav û lêvan jî bê par nake.

Her wesa penaberî jî li dev wî sê mêvanên bar giran hene, ew jî berf, bahoz û baran in, bi taybetî di demên ku xelik di çadir û konan de.

Heta vir û bes, ez ê ya din bihêlim ji xwendevan û hijêkerên helbesta Kurdî re, ji ber ku li nav paxçê helbestên navborî baş bigerin, gul, nêrgiz, nisrîn û sosinan li gorî dilên xwe hilbijêrin.

Her di dawiyê de ez bi hêvî me ku wî tiştekê baş pêşkêşî xwênerên xwe û pirtûkxana Kurdî kiribe, hêviya serkeftinê û berdewamiyê û berhemên bi nirix, di gel rêz û gulav û sipasiyê.

Kurtasiyek li ser pirtûk û jiyana wî :

Rojdiyar Xelef Hemê (( nivîskar û helbestvan))

Ji dayikbûyê bajarê Qamişloyê ye, taxa Qidorbeg sala 1960 , endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyayê ye.

Helbestê bi sê zimanan dinivîse Kurdî, Erebî, û carna bi Inglîzî jî.

Ji sala 1971 ji bajarê xwe koçber bûye, û niha li kampa Domîz bi cih bûye.

Destpêka wî di cîhana helbestê de li Helebê bû sala 1985.

Bi dehan hunermend û dengbêjên Kurd helbestên wî kirine stiran û stirandine, mîna ( Islam Zaxolî, Selah Resûl, I’tîdal Mehmûd, Mîdya Hiso, Sîpan Mêrkan, Aras Agir, Roken, Nûşîn, Jiyan, Gulbuhar, Îsa Ibrahîm, Hişyar Yaqûb, Besam Dêrkî, Şivan Cizîrî, Xemgîn Qamişlo ).

Heşt pirtûkên wî hene, çaran ronî dîtine û çarên din jî li ber çapê ne.

Pirtûkên wî yên çapkirî ev in:

**١- قارب ورقي - شعر كلاسيكي - مطبعة كازي بدهوك ١٥ – ٣ – ٢٠٢١**

2- Koçber û penaber im - Helbestên kilasîkî Duhok: çapxana:Gazî - 2022 Z.

**٣- بقبلات غجرية - شعر كلاسيكي وحديث - مطبعة كازي بدهوك – ٣٠ – ٩ – ٢٠٢٢**

4- Ji Geza sêvê min zanî- helbestên Kurdî kilasîkî.

Pirtûkên wî yên ne çapkirî jî ev in :

1- Ne bext û ne zanîn helbestên kurdî nûjen

**٢- حب في زمن الجوع - شعر عربي.**

**٣- البصمة البيضاء المشاكسة - قصص قصيرة جدا”**

4- Landika lawêjan - helbestên Kurdî ji bo zarokan.

# Romana nivîskar Mahir Hesen hat belavkirin

Kurdistan

Herî dawî ji aliyê Dar El-Nuxba bo Weşandin, Çap û Belavkirinê li Qahîra, romana nivîskar û helbestvanê kurd Mahir Hesen bi navê “Heman cih, heman jin” derket. Di pirtûkê de (112 rûpelên navîn) tabloya bergê ji aliyê Şêwekar Dilewar Omer cih digire. Roman ji şeş beşan pêk tê û tê de nivîskar qala evîneke tevlîhev dike ku di navbera mêrekî bi navê Feraşîn û jina bi navê “Pel Şîn” de derdikeve. Lehengên wê bi zehmetî, rewşên jiyanê û tevgera mirovan re rû bi rû man. Ew behsa nirxa mezin a evînê dike ku di jiyana mirovan de serdest e û bi wan re di rêwîtiyek keyfê ji xem û êşên evînê de dibe. Paşî çîrok bi awayekî din diqewime û bûyer berovajî dibin û lehengê wê Feraşîn, piştî ku hemû dergeh û rê li ber xwe digire, biryar dide ku ji cihê xwe bireve. Zêdetirî çar sal derbas bûn ku wî biryar da ku rûbirûyê heskiriya xwe were, ku hema hema Dilbera wî Pel şîn di be ku bidin zilamekî din, wisa hewl dide ku wê vegerîne. Ji bilî gelek mijarên bêdawî yên jiyana kesane ya ku bi êşên piralî ve girêdayî ne, nivîskar ew di romanek bi mijarek kurtî berhev kirine. Ji aliyê nivîskarê ciwan Mahir Hesen ve ev Pirtûk hatiye weşandin: - “Derbasbûna ji Bakur” lêkolîn, bi Erebî. Ji Dar Al Dalil li Berlînê 2021 -






Helbest bi zimanê kurdî, bi zaravayê kurmancî, bi tîpên latînî, bi navê “Keniya Te.” Ji Dar El-Delîl li Berlînê, 2022. - “Esman ji Hembêza min ket” romaneke bi zimanê Erebî ji Dar El-Nuxba li Misrê 2023 - “Heman cih, heman jin” romanek e ku ji hêla Dar El-Nuxba Misrê ve hatî çap kirin 2024 - Lêkolînên li ser Kurdistana Sûriyê bi zimanê Kurdî bi zaravayên Soranî, Kurmancî û Badînî, hîn nehatine ragihandin.

## Gijnîj



Dr.Munîb Ehmed

Bi kurdî:Gijnîj. Bi Latinî:Coriandrum Sativum. Bi Arebî:**كزبرة**. Bi Rûssî:Кориандер. Bi Ingilîzî:Coriander. Gijnîj riweka yek salane ye ta 70 Cm dirêj dibê lasika wê rûte û zirav e ,Pelên wê keskê vekirî û sêpirt in wek Bexdenûsê kûlîlkê wê sîwanekê pêk tiînin ,rengê kûlîlkên wê sipî pîvazî ne ,berên wê giroverî, reşesmer yan qehweyî ne ,bi şînatî bihna Gijnîjê taîbete û ne wilqasî xweşe lê piştî kû hişk dibê bihna wê dibê asayî, riwekê Gijnîjê di mehên cehzeran -tîrmehê de kûlîlka digrê û di tebaxê de ber digre û digihîje. Welatê Gijnîjê Rojhilata Navîne û li welatên derdora Deriyaya sipî û qefqasya. Cûreyê bejî peyda dibê lê yê bihtîr tê çandin. Pêkhateya kimawî: Di berê gihiştî Gijnîjê de ta 0,7-1,4% Zeytên firok cih digrin ,teresê herî pir Linolol e (50-80%) her weha Terpên, Fêlandrên, Geranyol, Bornyol,Afîr û Aldigîd. Di libê Gijnîjê de ta 20%Zeît he ye. Beşê kû wekî Derman tê bikaranin libê Gejnîjê ne ,piştî kû dighêjin bi Amûrên taybet têne danehev Pêkhata Zeyta Êfîr dighêjê ta 0,5% jî tevaiya berê Gijnîjê ew jî wekî Derman tê bikaranin jî bo nexweşiyên qolinc û bedguvêrî hinava û ji bo Nasûrê her weha dixin nav Dermana de ji bo tam û bihna wan xweş bibê. Linalol a kû pêkhateya herî giringî zeîta firoke ya Gijnîjê ,jêdera Tsêtral e ya kû di dermankirina çavan de tê bikaranin wekî kulbûna gilêne, ,reşkîn ,perçimokê. Gijnîj di pîşesaziyê de tê xebitandin,her weha dixin nav Bihinxoşa de û dixin nav xwarinê de wekû biharat.

